



Şeş hokarên sereke: Rêbera malbatan

Lêkolînan nîşan daye ku şeş hokarên girîng û bingehîn jibo bidestxistina şiyana xwendina seretayî xwedîrol in. Ji ber girîngiya van hokaran, nasnava "Şeş Hokarên Sereke" ji wan ra bijartine: Zimanê devkî, agahiya awanasiyê, dengnasî, peyv, serdestî û têgihîştin. Di salên destpêkê yê dibistanê da, "Şeş Hokarên Sereke" derbasî nav dersên fêrkariyê dibin.

Zimanê Devkî

Zimanê devkî çi rolek di xurtkirina pisportiya xwendinê da heye?

Zimanê devkî bingeha pisportiyên Fêrkarî û hînbûnê ye. Heke zarok bikare pisportiya xwe ya zimanê devkî bi riya gotûbêja digel mezinan û zarokên din xurt bike, "Bank"eke mezin ji peyvên axaftinê bi dest dixê; Peyvên ku wateya wan di pêvajoya têkiliyên axaftinê têdigihêje (seredana beşa [Peyvan](#) bike).

Zarok dê listin abi peyvan û qafiyeçêkirinê bibihêzin û têda beşdar bibin, û dê dengên Inglîsî nas bikin (seredana beşa [Agahiya Awanasiyê](#) li jêrê bike). Ewna dê cûreyên hevokan nas bikin û şewaza guhertina ziman di mewqiyên cûrbecûr têbigihêjin (seredana beşa [Serdestî](#) li jêrê bike). Ewna ndê fam bikin ku peyv xwedan wateyeke taybet in û em ziman jibo veguhestina lêzanînan, îde, hest û fikrên xwe bi kar tînin (seredana beşa [Têgihîştin](#) li jêrê bike).

Dêbav çawa dikarin zimanê devkî yê zarokan li malê xurt bikin?

Dêbav dikarin bi dabînkirina derfetên cûrbecûr jibo guhdarîkirina zarokan û gotûbêja derbarê mijarên cûrbecûr, jibo xurtkirina zimanê devkî alîkariya wan bikin.

Li vir amaje bi hin şewazên sûdmend ên xurtkirina zimanê devkî li malê tê kirin:

- Digel zarokên xwe biaixin û bi baldarî guh bidin wî/wê. Bipirsin û bersivê bidin.
- Herîkê carekê di rojê da jibo zarokê xwe bi dengê bilind bixwînin. Pirtûkên guncan peyv û pêkhatayên hevokî ku bi giştî di rewşên wan ên rojane da nayên bihîstin, bi zarokan ra didin nasandin. Lêkolînan nîşan daye ku xwendina bi dengê bilind jibo zarokan roleke girîng di warê hînbûna xwendinê da dibistanê da heye.
- Bi zarokê xwe ra derbarê pirtûkên ku we ewna bi dengê bilind xwendine, biaxivin. Derbarê kesayet, dîzayn an zemîneya Çîrokê, mijar û îdeyên pirtûkê, mijarên ku zarok piştî xwendina bi dengê bilind meraq dike wan hîn bibe an bixwîne, ji zarokê xwe bipirsin.

Di beşa Jibo Malbatan di Navenda Fêrûbên (Literacy Hub) da tewsiyeyên zêdetir derbarê rola dêbavan di xurtkirina geşedana zimanê hatine raberkirin.

Peyv

Rola peyvan di xurtkirina pisportiya xwendinê da çi ye?

Heke bazineya peyvên "Axaftinê" ya zarokan berfireh bibe, yanî ewna gelek peyvan bi kar binin û fam bikin, hêza wan a têderxistin û naskirina wan peyvan di dema xwendina nivîan da dê zêdetir bibe.

Peyv dikarin li ser sê kom, an sê "Deste"yan bên parvekirin.

Peyvên desteya 1 pêkhatî ji peyvên axaftin û nivîsîne; peyvên wekî *the, and, was, some* û peyvên "Rojane" wekî *like, dog, happy, play, go*. Ev peyv wek peyvên "Pirr bikarhatî" an "Peyvên dîtbarî" tên binavkirin, ji ber ku xwîner wan di nivîsên cûrbecûr da dibînin û divê bikarin wan bi awayê xwebixwe û dîtbarî têderxînin û fam bikin. Gelek ji peyvên Desteya 1nabe ku bên "dengdarkirin", nivîsa wan rasterast digel şewaza bilêvkirina wan hevseng û beranber nîne, wek mînak , **was** wek **/woz/**, tê bilêvkirin. Ji ber vê yekê ev peyv divê bi awayê "Dîtbarî" bên hînkirin.

Peyvên Desteya 2 û Desteya 3 pêkhatî ji peyvên diwartir û Mijar-Mihwer (subject-specific) in. Zarokên ku komeke berfireh a peyvan di pêvajoya gotûbêjê an di dema xwendina bi dengê bilind a pirtûkan da dibihîzin, baştir dikarin wan di naveroka pirtûkan da fam bikin.

Dêbav çawa dikarin Peyvên zarokê xwe li malê xurt bikin.

Weke zimanê Devkî, Dêbav dikarin bi handana zarokan bi axaftin û guhdarîkirina li mijarên cûrbecûr û xwendina bi dengê bilind a herî zêde jibo zarokan, alîkariya wan di warê Hînbûn û Peyvan da bikin. Zarok peyvên nû bi bihîstina berdewam a bikarhatina wan a hedefmend û bikaranîna herî zêdetir a peyvên nû di axaftinê xwe da hîn dibin. Ji riyên din ên xurtkirina Peyvan em dikarin amaje bi babetên jêrê bikin:

- Di dema xwendina bi dengê bilind da, "Peyv-Hişyar" ('word aware') bin. Zarok dikarin bi bihîstina nivîsên wêjeya zengîn û dewlemend a zarokan bi bikaranîna hedefmend, peyvên nû nas bikin. Derbarê peyvên ku hûn dizanin jibo zarokê we nenas in, şirove bikin. Dengê wan çawa ye, wateya wan çi ye, çi tiştekî tînin bîra we?
- Li derveyîmalê ji zarokê xwe bixwazin ku peyvan keşf bikin ('word detectives'). Bala xwe bidin ser peyvên nû û balkêş li ser tabloyên nav kolanan, li baxa ajelên kovî an Mûzexaneyê, an Menû û Lênûskan.
- Di dema axaftina bi zarokê xwe ra, peyvên cûrbecûr bi kar binin. Ji zarokê xwe bixwazin ku wateya peyvên nenas bipirse û di têkiliyên xwe yên bi axaftinê da, peyvên nû bi kar binin.

Agahiya Awanasiyê

Agahiya Awanasiyê çi roleke xwe di xurtkirina pisportiya xwendinê da heye?

Agahiya awanasiyê heman şiyana bihîstina dengên di warê zimên da ye. Zarokên bi Agahiya Awanasiyê ya guncan û baş dikarin babetên jêrê bibihêzin:

- Peyv û navbirên peyvên di zimên da
- Kîte (Yekîneya bilêvkirina bi tîpeke dengdar, **cat** Kîteyeke xwe heye, **water** du kîte anku Sîlabên xwe hene)
- Qafiye anku 'rhyme' (Du an çend peyv bi dengê dawiyê yê wekî hev, **ring, sing, thing**)
- Pevdengiya Awayî anku 'alliteration' (Du an çend peyv bi dengê destpêkê yê wêqêhev, **Peter Piper picked a peck of pickled peppers**)
- Wac anku 'phonemes' (yek bi yekê dengên peyvekê **dog** sê wacên wê hene, **d-o-g**).

Hebûna Şiyana bihîstin an "Jihev-veqetandinê" ya van dengên biheve jibo hînbûna destêwerdana dengên hevok û peyvên di pêvajoya Hînbûna xwendinê û Kîtekirinê da jibo zarok dabin dike.

Dêbav Çawa dikarin Agahiya Awanasiyê li Malê xurt bikin?

- Pirtûk an helbestên bi peyvên hevqafiye di dawiya rêz an hevokê jibo zarokê xwe bixwînin. Rê bidin zarokê xwe bila beşdar bibe û peyva ahengîn (rhyming) a din pêşbînî bike.
- Guh bidin ser kîteyên peyvên nasyar û nû û bi dengê destê xwe diyar bikin, wek mînak **jump-ing, wa-ter, ha-ppi-ness, fab-u-lous**.
- Awaz û sitranan bixwînin, helbestên zarokane, stran, Tiştanok, helbestên pêkenî, zûgotinok û pêkeniyên bixwînin.

Dengnasî

Rola Dengnasiyê di xurtkirina Pisportiya Xwendinê da çi ye?

Dengnasî xwe dispêre Agahiya Awanasiyê. Di dersên Dengnasiyê yê dibistanê da, zarok şêwaza pevgerêdana deng an Wacê li tîpên alfabeyê an komeke ji tîpên nûnerê alfabeyê nas dike. Di rêbera malbatan da di beşa Jibo Malbatên "Navendê" gelek lêzanîn derbarê Dengnasiyê hatine raberkirin.

Dêbav çawa dikarin qabiliyeta Dengnasiyê ya zarokê xwe li malê xurt bikin?

- Nivîsîna nameyê bi zarokê xwe ra bidin hînkirin. Di destpêka nêv da tîpên mezin bi kar bînin û tîpên din biçûk binivîsin. Nêv (navî) binivîsin û rê bidin bila zarokê we wan bişopîne, bi zarê we bike, bi hevriê lîstikê wan çêbike an wan li ser xîz û qûmê binivîse.
- Di dema bihevre xwendinê da, amaje bi peyv û tîpan bikin. 'There's the letter M, it says mmm for Mummy. Can you see the S that says sss for Sam?'
- Ji zarokan bixwazin ku tîpên navê xwe an navê endamên malbatê li cihên din wekî pirtûk, tablo, pakêta berheman û ser şûşeyên firoşgehan peyda bikin.
- Amaje bi fontên cûrbecûr, şêwaza nivîsîna tîpekê, di dema xwendinê da û li derdorê bikin.

Serdestî

Rola Serdestiyê di xurtkirina pisportiya xwendinê da çi ye?

Serdestiya xwendinê amaje bi asta hêsanbûna xwendinê ya zarokan dike. Di dema xwendina bi dengê bilind da, baldarî, lez û çawaniya raderbirinê û axaftinê bandorê li xwendina bi dengê bilind dike. Jibo alîkariya bo xwendina bi dengê bilind hevrê digel serdestiyê di salên destpêkê yê dibistanê da, fêrkar pirrî wextan ji wan dixwazin ku pirtûkên hêsantir an nasyar bi dengê bilind bixwînin. Bi vî awayî zarok pirrî wextan bi xwebawerî dest bi xwendinê dike û peyvên bi awayê xwebixwe û deqîq ji hev têderxîne. Zarok dikare bi lezeke gellek wek leza zimanê axaftinê pirtûkan bixwîne û halet, lehna gotinê, rawestan û ahengê bi kar bîne.

Serdestî dibe sebeb ku xwendina devkî zindîtir bibe û peyama nivîskar bi awayekî aşkiratir were veguhestin. Hebûna şiyana xwenina serdest dibe sebeb ku xwînerên biçûk baweriyê bi şiyana xwe yê xwendinê bînin û meyl û meraq û lezeta xwendinê di wan da çê bibe.

Dêbav çawa dikarin Serdestiya zarokan jibo xwendinê li malê xurt bikin?

Baştirîn karê ku dêbav dikarin jibo xurtkirina serdestiya xwendinê ya zarokan li malê bikin, nîşandana wê ye.

- Pirtûkên ku zarok jê hez dikin bi caran bixwînin.
- Nivîsan bi hest bi zimanê xwe yê sereke an bi zimanê Inglîzî bixwînin.
- Di dema xwendinê da, efektên bi deng pêk bînin.
- Dengên cûrbecûr jibo nîşandana kesayetî û vebêjê çîrokê bi kar bînin.
- Bilindbûn, lehn û leza deng di dema xwendina beşên cûrbecûr da biguherînin. Wek mînak kêliyên bi tirs bi kêmkirina leza xwendinê, an kêliyên dilgiranker bi zêdekirina leza xwendinê nîşan bidin.
- Dem û gavên mijûlker pêk bînin û zemîneya hezkirinê jibo xwe û zarokê xwe dabîn bikin.
- Hevrê digel zarokê xwe guh bidin pirtûkên bideng. Hûn dikarin gellek ji pirtûkên zarokan bi awayê bideng ji pirtûkxaneyê cihê jiyana xwe daxînin.

Têgihîştin

Rola Têgihîştinê di xurtkirina pisportiya xwendinê da çi ye?

Têgihîştin an famkirina tiştê ku tê xwendin, armanca giştî ya xwendinê ye. (Jibo dîtina diyagrama bi hûngilî ya pêvajoya xwendinê berê xwe bide Dengnasî: Rêbera malbatan) Şêwaza têgihîştina xwînerên pisport û hoste li gorî cûreya pirtûk, nivîsar an Malpera ku nivîs têda ye, ciyawaz e. Xwîner nivîsan bi van riyên têgihîştinê:

- Pêşgotin beriya xwendinê û di dema xwendinê da
- Pêkanîna têkiliyê navbera tiştê ku tê xwendin û tecrubeyên berê ji pirtûk, jiyana û cîhanê.
- Hilêxistina pirsan derbarê nivîsa ku tê xwendin. Ev kesayet di vê rewşê da çi dike? Çima wî kesayetî ew kara kir.
- Şopandina têgehê, vekolandina pêşgotinan, piştrastkirina wan, sererastkirina wan, pêşgotina dubare û jinûve xwendin
- Pêkanîna kurteya zihnî ji beşên girîng ên Çîrokê an Lêzanînan
- Pêkanîna dîmena zihnî ji keayetî û zemîneyê
- Têgihîştin, Şirovekirin p xwendina "Navbera Rêzan" ('between the lines')
- Fikirin li ser têgeha nivîsê Çima nivîskar ev pirtûk nivîsiye? Nivîskarê nivîsarê çaverêya çi bertekekê ji aliyê xwîner va bûye?

Dêbav çawa dikarin Têgihîştina zarokan li malê xurt bikin?

Jibo ku bi zarokan ra bidine famkirin ku armanca xwendinê heman têgihîştina wateyê ye, nivîsên cûrbecûr digel hev jibo armancên cûrbecûr bixwînin û piştra li ser tiştên ku we bi hev ra xwendine, biaxivin. Têgihîştin nabe ku bi neçarî be, belkî divê xwezayî û pêkhatî ji xwendinê be.

- Berteka xwe derheqê bihevre xwendina pirtûkê digel zarokê xwe parve bikin. Min ew beşa hez dikir... te kîjan hez dikir? Vê beşê ez matmayî kirim... tu di kîjan beşê da matmayîbûyî?
- Derbarê pirtûk an tecrubeyên din ku xwendina pirtûkan wan tîne bîra we biaxivin. Hûn dikarin bibêjin: Ev weke pirtûka din e ku me bi hev ra xwend... wê beşa Çîrokê hev dîtina min digel Dapîrê anî bîra min û ...
- Di dema xwendina bi dengê bilind da li nuqteyên balkêş ên Çîrokê rawestin û wan pêşbînî bikin; wek mînak: Oh, çi mewqiyêke balkêş e. Ez dixwazim bibînim kanê kesayetiyê çîrokê di vê mewqiyê da çi dike? Bi nêrîna te hesta kesayetî di vê mewqiyê da çi ye? Çi bûyereke dikare biqewime?
- Piştî xwendinê, çîrokê jibo hevdu vebêjin. Çîrokê bi lixwekirina kincan, bikaranîna bûkik an peykerê, nîgare an karên destçêlkirî, xîza lîstinê an Hevîrê Lîstinê bikin şano.

Çavkanî:

Cairney, T (28 November, 2020) [Literacy families and learning](http://trevorcairney.blogspot.com/), Blogspot. (<http://trevorcairney.blogspot.com/>)

Anderson, R, Hiebert, E. Scott, J. and Wilkinson, L (1985) *Becoming a nation of readers: The Report of the Commission on Reading*, US Department of Education

Hayes, DP and Ahrens, MG (1988) 'Vocabulary simplification for children: A special case of "motherese?"' *Journal of Child Language*, 15: 395-410